



Vegera Lîfît (*)

Helbestvan: Jumana Haddad **Wergerandin ji Erebî:** Cankurd
Eve parek piçûk e ji helbesteke pir dirêj a bûye pirtûkek
(عودة ليليت مترجمة إلى الكردية - جان كورد)

Lîfît: Navê wê di mîtolojiyên Somerî, Babilî, Asûrî û Kanaanî de hatiye, weku di Peymana Kevin û di Telmûdê de jî. Efsane hewal dide, ku ewa jina pêşîn bû, ku Xwedê ew ji axê, mîna Adem pêda kirî bû, hema Lîfît bi binvebûna çavkorkî nepejirand û dilê wê ji behîştê rabû, serî hilda û reviya, û dil nekir, ku carek dî vegere. Hîngê Xwedê ew nebed kir siyayên zevînê çol, pişt re ji parsûwa Adem jina dî pêda kir, Hewa.

Sereta 1

Ez Lîfît im; Jina qeder im. Nêrek nikane xwe ji qedera min vedize, û ne jî nêrek dixwaze xwe ji min vedize.

Ezim jina herdu heyvan Lîfît. Reşbûna wan bê sipîbûna wan naçe serî, ji ber ku paqijiya min çîka bedkariyê ye, û xwe ji dest nedana min destpêka degunciyê ye.

Ezim jina behîşt, a ku ji behîştê ketiye, û ezim ketina behîştê.

Ezim Lîfîta bakîre, rûyê leşfiroşa nexweyayî, dayîka dildar û jina mêr im. Şevim ji ber ku ez rojim, û ez aliyê rastê me ji ber ku ez aliyê çepim, û başûr im ji ber ku ez bakur im.

Ezim jina mase û ezim ên vexwendiyên wê ne. Ez bi goniya şevê ya bi perr hatim naznavkirin, û xelkê Somer û Kanaan û gelên herdu çeman min bi xwedîka dilxwezî û ji rê êxistinê bi navkirin, û ez bi xwedîka tamzariya belaş û mehdera piştanîna (1) xwe bi xwe navkirime. Min ji merca zarokanîne rizgar bikin, da ez bibim qedera herheyî.

Ezim Lîfîta herdu memikên sipî. Kosanî (2) li hember sihirbaziya min naye kirin, ji ber ku porê min reşe, dirêje, û herdu çavêd min hingivînin.

Di ravekirina pirtûka yekê de hatiye, ku ez ji axê hatîme pêdakirin, û ez bûme jina yekê ya Adem, hema min ew tanc nepejirand.

Ezim ya yekemîn, a ku têr nebû "bes nebû", ji ber ku ewa hevpêgeha bêkêmanî ye, Kirin û jêgirtine, jina serhildanê ye ne jina tancpejirandinê ye...

Erê. Dilê min ji Adem ê mêr rabû, û ji Ademê behîşt rabû, dilê min rabû û min nepejirand û ez ji fermanberiyê derketin.

Gava Xwedê melekên xwe hinartine, ku min vegerînin, ez dilîstîm. Li ber kenarê Zireya Sor ez dilîstîm. Ez xwestim, lê min nedivîya, Ez dame tîmarkirinê, ku tîmar bibim, lê ez tîmar nebûm. Ez daxistim mişextiyê, ku bibim êşa jixweçûnê. Ez kirim destegîra çolezevînê, û nêçîrkirîya siyên hov, û min kirin revoya cinawerên hov.

Gava min dîtin „bidestxistin“ ez dilîstîm. Min erê nekir, ez nebed kirim û derkim, ji ber ku ez ji yê nivîsandî derketî bûm. Û gava min derkirine, tenha mêrê min Adem bi tenê xwe

ma, bi tenê, cinawerkirî û gazincok „gilîvan“. Çû ba Xwedayê xwe, û Xwedayê wî ji wî re jinek ji parsûwa wî pêda kir, ku bi Hewa dihate nasîn û ew bi nimûneya duwem navkir. Ew pêda kir, ku mirinê ji dilê wî bide revandin, û gudandina afirandinê misoger bike.

Ez im Lîlît jina yekem, hevpara Adem di afirandinê de, ne parsûya tancê. Xwedê min ji axê pêda kir, da ez kok bim, û ji parsûwa Adem Hewa pêda kir, ku bibe sî.

Gava ez ji mêrê xwe dilhosan bûm, ez derketim ku jîna xwe bikim jêma, min peyamnêra xwe, mar, coland „hirhitand“, ku Adem bi sêva nasdariyê ji rê bêxîne, û gava ez biserketim, min şeydakirina „fîtneya“ gunahê vegerand bo pêjiniyê, û tamxweşiya tawanê bo seretayê.

Ezim jina jin, xwedîka dayîk û xwedîka jin. Min xwe mêşeng kir, da bibim dot „qîz“ û firêwdana her demekê. Min rastî û efsane li xwe mar kirin, da ez bibim herdu. Ezim Delîle û Salomî û Nefertîtî ji nav jinan, û ezim şahbanoya Sebee û Hêlêne ya Troya û Meryema Mecdelî.

Ezim Lîlît, jina hîlbijartî û jina berdayî, şev û firindê şevê, jina rastîn û efsaneya jin, Eştar û Ertmîs û bahozên Somerî, zimanên pêşîn min hewal didin û pirtûk min şirove dikin, û gava navê min di nav afretan de tê lêvkirin, diraz „duaa“ nifirînan bi ser min de dibarînin.

Ezim tariya mê, ne mêya ronahiyê. Çi şirovekirinek nikane min bijmêre û ne jî ezê tanca wateyekê bipejirînim. Û Mîtolojiya ez bi nebaşyan bêdeng kirim, û jinan ez bi mêranîyê kevir kirim, hema ez ne ya rengemêr im û ne jî jina lîstokim, lê belê tevbûna mêbûna kêma im. Ez cengê li mêran nakim û ne jî korpeleyan „cenîn“ ji dangên „rehimên“ jinan didizim, lora ezim Şeytana ku têye xwestin, gopalê nasyariyê û gustîlka evîn û azadiyê me.

Ezim herdu nijad, Lîlît. Ezim nijadê daxwazkirî. Ez dibim û nadim. Ez Adem vedigerînim rastiya wî, û bo Hewa gihanên wê yên dirinde, da jîrbêjiya „mentêq“ afirandinê ciyê xwe bigire.

Ezim Lîlît hevta hatîme pêdakirin, û jina hevta me
Ji mêr kêma nabe, da poşman nebe
û ji
afretê
kêma nabe
da ew
hebe

1) Piştanîn: Gava mêrek li gan dikeve, li dawiyê piştta wî tê

2) Kosanî: Berxwedan

*) Helbestvan û rojnamevan Jumana Haddad Lubnanî ye, berpirsa rûpelê çandeyî di rojnameya „Annahar“ a Lubnanî ye, serpereştiya xilata cîhanî bo romana erebî (Bokir) de, endama encumena pirtûk û xwendinê ye di wezaretê çandeyî ya Lubanê de, xilata rojnamevaniya erebî sala 2006 standiyê, bi heft zimanan dizane, û wergerandinê wê di helbest, roman û şano de hene, ji wan jî „Antolojiya helbesta Lubnanî ya nûjen“ bi Espanî, hinde qefteyên helbestê yên bi nav û deng belav kirine û ji wan jî hatîne wergerandin bo zimanên biyanî, gelek hevpeyvîn û çavpêketinên fireh bi hinek nivîskarên cîhanî yên navdar re kirîne, wekî Ombêrto Êko, Paul Oster, José Saramago, Paulo Kuwêlo, Peter Handke û h.d.

- - كاتبة وشاعرة ومترجمة وصحافية لبنانية.

- من مؤلفاتها :

* في الشعر:

- وقت لحلم : بيروت، 1995.

- دعوة إلى عشاء سرّي : دار النهار للنشر، بيروت، 1998.

- يدان إلى هاوية : دار النهار للنشر، بيروت، 2000.

- لم أرتكب ما يكفي : مختارات شعرية، دار كاف نون، القاهرة، 2003.

- عودة ليليت : دار النهار للنشر، بيروت، 2004.

دار آفاق، القاهرة، 2007.

- النمرة المخبوءة عند مسقط الكتفين : مختارات شعرية، منشورات الاختلاف والدار العربية للعلوم، الجزائر، 2007.

- عادات سينة : مختارات شعرية، الهيئة العامة لقصور الثقافة، القاهرة، 2007.

- مرايا العبارات في المنام : دار النهار للنشر والدار العربية للعلوم، بيروت، 2007.

* تُرجم لها:

- مختارات شعرية بالألمانية :

.kann, 2006, Lisan Verlag, Basel, Switzerland Damit ich abreisen

- مختارات شعرية بالاسبانية :

.Cuando me hice fruta, 2006, Monte ?vila Editores, Caracas, Venezuela

- "عودة ليليت" بالاسبانية :

.Praxis, Mexico, Mexico El retorno de Lilith, 2007, Editorial

- "عودة ليليت" بالفرنسية :

.Lilith, 2007, Editions L'Inventaire, Paris, France Le retour de

- مختارات شعرية بالإنجليزية :

.USA ,Invitation to a Secret Feast, 2007, Tupelo Press, Vermont

- "عودة ليليت" بالألمانية :

.Schiler Verlag, Berlin, Germany Die rükkkehr von Lilith, 2008, Hans

البريد الإلكتروني joumana.annahar@gmail.com

الموقع الإلكتروني www.joumanahaddad.com